

**Michael Chyet: Kurd bi qîmeta zimanê kurdî nizanin!
Hevpeyvîn: Sîrwan Hecî Berko**

Michael L. Chyet zimanzanekî cihû û emêrîkî yê zimanê kurdî ye. Ew 46 salî ye û bêtirî 30 zimanan xwendine.

Berî demekê, ferhenga wî ya 'Kurmançî-İngilîzî' ji aliyê Weşanxaneya Yale University Press ve li Emerîkayê derket. Ferheng ji 847 rûpelan pêk tê. Gotinên kurdî bi tîpên latînî û erebî hatine nivîsandin û bi şêweyekî berfireh wateya wan a bi zimanê ingilîzî hatiye nivîsandin.

"Îşê vê xebata min bi siyaset û hikûmetan tune ye," wiha Chyet dibêje. "Ez xema paşeroja vî zimanî dixum û bi hêvî me, ku ez ê bikaribim alîkariya standardkirina wî bikim. Ez ji vî zimanî hez dikim û naxwazim ku bimre. Zimanê kurdî ne mirî ye, lê pêwîstiya wî bi Pêşvebirinê heye."

Michael Chyet berpirsiyarê beşê kurdî yê Radyoya Dengê Emerîka bû. Herweha ew profesore zimanê kurdî li Zanîngeha Parîsê û Instîtûya Washingtonê ya Kurdî bû. Ew niha li Pirtûkxaneya Kongireya Emerîkî li Washingtonê kar dike.

Min li ser telefonê ev hevpeyvîn pê re kir:

MALPERA AMÛDE: Di pêşgotina pirtûka xwe de, tu bi şêweyekî neyekser bangî Kurdan dikî, ku xwedî li zimanê xwe derkevin, çimkî ew ber bi windabûnê ve diçe, wek ku te xwest bêjî. Çima wilqas tirs li ser windabûna zimanê kurdî?

MICHAEL CHYET: Berî hemî tiştî, ez mecbûr im bêjim, ku her tiştê ku ezê bêjim, dîtina min a şexsî ye û ne ya Pirtûkxaneya Kongirêsê ye. Ez mecbûr im wisa bêjim.

Ji ber ku ez dibînim -çi li Kurdistanê Tirkîyeyê û çi li Ewropayê -, ku gelek Kurd hene, ku bi zarokên xwe re bi zimanên din dipeyivin, çi tirkî be, çi firensî be, çi elmanî be, çi ingilîzî be.

Zarokên wan bi kurdî nizanin, yanî paşeroja vî zimanî di bin gefê de ye. Dirûşma min li ba Kurdan bila wisa be: 'Zimanekî wisa ku zarok pê nepeyivin, zimanekî bê paşeroj e!' Her tiştê ku Tirkan ta niha kiriye, ku zimanê kurdî ji nav bibin, tesîra wê nebû, yanî ziman nebîr. Lê niha her tiştê guhertin. Rewş hatiye guhertin. Û eger Kurd bi xwe xwedî li vî zimanê dernekevin, ditirsim ku 20 salên din ev ziman namîne.

Tu behsa Kurdên ji derveyî welat dikî.

Çi ji derveyî welat, çi li hundirê welat. Bo min niha herdu yek in. Gelek Kurd qîmeta zimanê kurdî bi serê xwe fêhmakin. Gelek Kurd zimanê kurdî bi kar tînin, da ku hikûmeta tirkî nerehet bikin. Ew bi xwe nabînin zimanê kurdî çiqasî xweş û bedew e. Eger Kurd bi xwe zimanê xwe neparêzin, ew dê winda bibe, ji holê rabe.

Tu behsa Kurdên Bakurê Kurdistanê dikî.

Problêma Kurdên din tune ye?

Li Kurdistanê Tirkîyê navbera 12-20 milyon Kurd hene. Li Sûriyê mesele tiştekî din e, û li Iraqê jî tiştekî din e. Li wan deveran gef bi awayekî din e.

Ta niha standardek ji bo zimanê kurdî peyda nebûye. Tu vê yekê problêma dibînî?

Ta niha, me nikarî zimanekî standard biafrînin. Wexta ku em - gava ku dibêjim 'em', ez jî tê de me - xwe yek bigrin, divê em zimên jî yek bigrin. Hemî hîcetên ku berê hebûn, kêmbûne yan nemane. Niha, ji ber internê, televizyon û radyoyê, Kurd dikarin bigihên hev. Haya min li Tirkîyê jê heye, Kurdên Sûriyê, Iraqê û Îranê çi dikin. Herweha ez dikarim di rêya internê û televizyonê bizanibim ka ew kîjan peyvan bi kar tînin. Kurdên Tirkîyê ne dizanî, ka xuşk û birayên wan li Sûriyê, Iraqê û Îranê çi ji bo filan peyvê digot; haya wan ji hevdû tune bû. Lê îro rewş ne wisa ye; êdî hatiye guhartin. Herkes dikare bikeve internê û bibîne, an jî li bernameyên →